

Îran bandora xwe  
li Yemenê zêdetir  
dike

»»» R:7




Pasoprt Komarê

»»» R:2



Kurd û Girêbes-  
ta Tirkayetîyê

»»» R:4




Êzîdî  
û asoyên  
pêşerojê

»»» R:5



Gel di-  
jberên sereke  
yên rêjîmê ne

»»» R:6



*Bideştveanîna mafên netewî yê gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (366) 21-01-2020 Buha (1000) Tûmen

Hatina “Waliyê Kurdan” bo mala mezin

## WALIYÊ KURDAN

**Y**ekek ji kevnar-  
tirîn girtiyê siyas  
ê Kurd, piştî vê ku ji  
girtîgehê hate berdan,  
dîsan hate nav refên  
hevçeperên xwe û carek  
din emegnasiya xwe bi  
rêbaza nîştîman îsbat  
kir.

“Walî Dirûdî” girtiyê  
siyasî ê Kurd, piştî  
azadbûna wî li 26`ê  
Sermawezê û piştî  
23 salan di girtîgehê  
de, hate nav refên  
tekoşerên Partiya De-  
mokrat a Kurdiştana  
Îranê û çepera berxwe-  
danê, û berengarbûn û  
xebata girtîgehê digel  
xebata çiya li hev  
aland.

“Walî Dirûdî”, bi  
tohmata çalakî li  
dijî rejîma terorîst  
bi hepsa hetahe-  
tayî hatibû cezadan,  
û piştî 23 salan tes-  
lîmnebûn li hember  
rejîma xwînmij û  
tevî îşkencedîtîne,  
dîsan biryara şoreşê  
da, û hate nav refên  
tekoşerên partiya xwe.

Ew hatiye da ku tevî  
ezmûnên xwe yê xw-  
eragirî yê zêdetir ji  
du dehikan, bi zimanê  
sebûrî, peyv bi peyv û  
hevok bi hevok sozên  
yekem roja xebatê  
dûcarî bike, û deşt di  
nav deştê hevalên li  
nav çeperê danê, û  
pêngavan hilgire. Bas  
basa paşerojê û erkên



nû ye. Mêrxasê vê şoreşê, pêşmerge vê Komarê neketiye û eşkeretir ji her demekê hatiye bo rizgariya  
yekcarî, da ku azadiyê bike diyarî. Şeytan nikare rojê biveşêre, û şev nikare pêşî ji şefeqa sibêzû bi-  
gre, rastî wekî şitlên dara berûyê hişk nebûyî, şîn dibe. Strana vê barana xerîb wisa dike ku careke din  
kulîlk vebin.

“Walî”yê nîştîmana min, te di yekem dema xwe de ew dêwê zaliman xîste qedeman, ev bêbextiye û  
zilm, dema ku te biryar da li hember wî celadê xwînmij raveştî, em xatircem bûn ku çokên te narecîfin.  
Niha bejna te a sebûrî hertimî wê raveştayî bimîne.



## Sergotar

## Pasoporta Komarê

N: Kerîm Perwîzî

Girantirîn û nexweştirîn pîrsa ku li dervey welat berbirûyê Kurdekî derveyî welat dibe, ew e ku gelo tu xelkê kudêrê yî? Miliyeta te çî ye? Îca Kurdê ku xwe derbaz kiriye ber bi Ewropa û welatên din, ew jî ji deşt wê hemû zulm û ştema Komara Îslamî, û wisa hizir dike ku taze gihîştîye civakek azad û wê têde bêhneke rehet vede, lê her ji rîja yekem ve raştî valahiyeke mezin ya derûnî dibe.

Ji kuderê ve hatî? Hindî ku vê yekê şirove dike, û zêde bas dike, û dibêje ku ji Kurdistanê ve hatime û Kurd im, û ji deştê zulm û ştema Komara Îslamî reviyame, bo cîhan azad, lê yê hember bi zehmet jê fam dike. Kesên weha hene ku Kurdan nas dikin, û bi taybetî di van salên dawiyê de navê Kurd gellek bi berfirehî di medyayên derve hatiye baskirin, lê pîrsa serêke nasname yan jî bi Îngilîzî nationality ye.

Kurd ji Îranê derketiye û ger dibêje ez Kurd im, jê dipirsin ger tu Kurd î, tu ji kîjan welatî ve hatî? Ew yek pîrseke girîng e ku kurd li dervey wlat raştî wê tê, ku gelo nasnameya wî çî ye? Gelo Îranî yî tu? Hekî tu Îranî ninî, û Kurdistanî yî, bes ka Kurdistan?

Heya wê demê ku Kurd di nava erdnîgariya Îranê de ye, berbirûyê weha dudilî û şilejaneke nasnameyî nabe, jiber ku di nava erdnîgariya Îranê de berbirûyê pîrseke bi vî rengî nabe, ku nationality û hevvelatîyê kuderê yî, ger bo mînak di herêm Farsnişîn de jê bipirsin, ku tu kî-ê yî, û ji kuderê hatî, dibêje ku ez Kurd im û ji Kurdistanê hatime. Di nava

Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê 16`emîn civîna xwe lidar xist

**N**avenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê, bi serpereştiya berpirsê dewra navend, “Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê,” 16`emîn civîna xwe lidar xist.

Roja Sêşemî, rêketa 17`ê Bêfranza (7`ê Kanûna Paşîn), 16`emîn civîna Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê bi serpereştiya berpirsê dewra navend, “Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê,” birêve çû.

Civîn bi amadebûna aliyên endamên navendê deşt bi kar kir û piştê deştûra kar jî aliyê “Mihemed Nezîf Qadirî”, berpirsê Dezgeha Giştî a Pêwendiyên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û herwisa berpirsê dewra navendê, xistine ber bas û her yek jî amadebûyan têbînî û rayên xwe li ser xalên deştûra civînê bi hûrdî anîne ber bas.

Parek din ji karê civînê pêwendî bi rewşa deverê û herwisa rewşa niha a Îranê hebû, û herwisa li ser baykorta şanoya hîlbijartina perlemanê Îranê tekez kirin û di



vê derheqê de biryarên hewce dan.

Bi sedema nêzîkbûn li roja 2`ê Rêbendanê, salvegera avakirina Komara Kurdistanê, endamên Navenda Hevkarî li ser pêkanîna semînareke berfireh bi amadebûna hemû aliyekê ve û herwisa ragihandinan hevber bûn.

Herwisa di civînê de, çendîn mijarên din ên pêwendî bi karê Navenda Hevkarî gengeşe kirin û di vê derheqê de biryarên hewce li serê dan.

Civîn piştî çend demjimêran dawî pêhat.

Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê

18`ê Bêfranza a 1398`an

8`ê Kanûna Paşîn a 2020`an

bazineya erdnîgariya Îranê de nasnameya Kurdî û Farsî û Tirkî, Belûç, û Ereb û ....hwd di hemberî yektir de ne, di hemberî yektir de xwe pênase dikin. Herçend ku deshîlata kolonyalîstî hewl daye ku nasnameya Îranîbûna saxte bisepîne û hemû jî xwe bi vê nasnameyê bidin nasîn, lê bo sîstema Pehlewî-Xomêynî ew yek neçûye serî.

74 salan berî niha di Kurdistanê de Komara Kurdistanê hate avakirin ku deshîlateke neteweyî bû, û di hemberî êrîşa nasnameya Îranî ya deştçêkirî de ku Rizaxan disepand, Komara Kurdistanê wekî dijkiyareke xwezayî ya neteweyî li dijî wê sekinî û jidayîkbûna Komarê hewcehiyeka dîrokî-nasnameyî bû, ku takê Kurd kire xwedî nasname (howiyet)êke cuda ji nasnameya bi dilê Pehlewî!. Ew deshîlata neteweyî ya xwemalî ku di Mehabada paytexta Komara Kurdistanê de hate avakirin, cuda ji hemû pîvan û karên din, di mêtî û hizra takê Kurd de pênaseyeke nû ava kir, ku di cîhana modern de, sergêj nebe û ji aloziyê derbaz bibe.

Ew deshîlata neteweyî ya xwecihî di Mehabada paytexta Komarê hate avakirin, cuda ji hemû pîvan û karên din, di mêtî û hizra takê Kurd de pênaseyeke nû ava kiriye ku di cîhana modern de sergêj nebe û ji bêsêrûberî û aloziyê derbaz bibe.

Komara Kurdistanê ku di Rêbendana 1324-an de bi deştê PDKÎ û bi rêbertiya Pêşewa hate avakirin, bersiveke modern bo pîrseke modern bû, ku di dema bahozên bihêz ên aloziya fikrî û nasnameyî de, Kurdistan xwediyê îdeya taybet bi xwe be.

Piştî çend dehikan derbazbûna bi ser herifîna fîzîkî ya Komara Kurdistanê de, Komara Kurdistanê di dên û bawerîya Kurdistanê de her zindî ye, û hêma û nasname ye. Min jêve ye ku her takek Kurdistanê dibe aliyê kêr di xeyal û baweriyên xwe de pasporteke Komara Kurdistanê di berîkê de be, ku di her dem û cihekî û rewşeke taybet de bersivderê gellek pîrsyar û gellek kirîzên nasnameyî û fikrî dibe. Ew pasporta Komarê di berîkên me de, hem “nationality”a me diyarî dike, û hem jî wekî serdema Komara Kurdistanê bersiveke modern, ji bo pîrsên aloz ên modernîte me wê hebe.



Şandekî PDKÎ di merasima biaxêspartina Qeşe “Dinha Tuma Yûsif” de beşdarî kir



**N**ûnerê PDKÎ li bajarê Koyê di rêûresma biaxêspardina Qeşe “Dinha Toma Tusif” de beşdarî kir.

Rêkefta 21`ê Befranbarê, nûnerayetiya PDKÎ, li bajarê Koyê, bi axspartina Qeşe “Dinha Toma Yûsif” naskirî bi “Mame Qeşe”, qeşe bajarê Koyê “Hermote” ku di bûyereke hatocûyê de li ser rêya koyê bo Hewlêrê canê xwe ji dest da, beşdarî kir.

“Qeşe Dinha Toma Yûsif” kesayetiyeke civatî û xweşnav ê Koyê û gundê Hermotê bû, û doşayeti wî digel PDKÎ hebû, di dema mûşekbarana binkeyên PDKÎ de piştevanî ji Partiya Demokrat kir û rêzek taybet bo Partiya Demokrat hebû.

Nûnerayetiya Partiya Demokrat, sersaxî ji malbata Qeşe “Dinha Toma Yûsif” û xwişk û birayên Mesîhî ên Koyê û gundê Hermotê kir.

Di wê rêûresmê de, metranê Hewlêrê, û Qayîmeqamê Koyê, berpîrsê demûdezgehên hikûmetî û Partiyên herêma Kurdistanê, nûnerayetiya parlemana herêma Kurdistan û nûnerên bajarê Hewlêrê beşdar bûn.

Rêkxistinên Ciwanên Rojhilatê Kurdistanê civînek pêk anîn



Rêkxistinên Ciwanên Rojhilatê Kurdistanê di binkeya navendî a Komeleya Şoreşger de, civînek pêk anîn û di vê civînê de şanoya hilbijartina meclîsê baykot kirin.

Roja Pêncsemî 26`ê Bfranza 1398`an, Rikxistinên Ciwanên Rojhilatê Kurdistanê, di binkeya navendî a Komeleya Şoreşger de, civînek pêk anîn.

Civîn bi bîstek bîhengî bo rêzgirtin li tev şehîdên Kurdistanê dest pêkir.

Piştê hemû rêkxistinên helwest û têbîniyên xwe piştî gengeşekirina rewşa ciwanan di Îran û Kurdistanê, algorên deverê, pîrs û mijarên girîng ên roj û cîhanê, li hember lidarxistina hilbijartina meclîsê ragihandin, û piştê Rêkxistinên bi weşana daxuyaniyeke hevpar û hevaheng, hilbijartina şanoya meclîs a Şevra Îslamî baykot kirin.

Beşeke vê civînê bo gengeşekirina pîrensîbên lîjnêya hevahengî ya Rêkxistinên Ciwanan û pejirandina xalan hatibû terxan kirin û biryar hate dan ku lîjne bi bîhêzî û çendîn karê hevpar û çalakîyên berdewam kar bike û amadekarî bo duhemîn konferansa Ciwanê Rojhilatê Kurdistanê bike.

Sersaxiya Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ li xelkê Serdeştê

**D**e zgeha Rêkxistina Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, peyameke sersaxiyê bi boneya koça dawî a Dr. “Celal Hacî Zade”, kesayetiyeke akademîk ê xelkê bajarê Serdeştê, rû ji xelkê wî bajarî belav kir.

Peyamm wiha ye:

Xelkê nîştimanperwer ên bajarê Serdeşt!

Ronakbîrên xebatkar û ogirên zanişt û pêşkevtin!

Malbata xembar a mamoste “Celal Hacî Zade” (Raman)!

Jidetdana mamosteyê xebatkar, Dr. “Celal Hacî Zade” ziyaneke mezin bû ku li civatgeha tekoşerên meraqvanên xizmet bi gel û nîştiman a tepeser a me ket.



Dr. “Celal Hacî Zade”, kesayetiyeke nîştimanî ê naskirî, xweşnav û bîrmend ê gelê me bû ku bi awayekî cangorî para herê zêde jiyan û şiyana xwe terxanê xizmetkirin bi gel û welatê xwe kiribû û ji ber sedemekê ku cihê şikê bû, bo hertimî ji destê me çû.

Tevî jîdestdana mamoste “Celal Hacî Zade” ku em daxdar kirin, em sarsaxiyê dibêjne xelkê bajarê Serdeştê, rûnakbîran û tekoşerên rêya pêgihandina ciwanên nîştimana me bi giştî û malbata rêzdar a Dr. “Celal Hacî Zade”.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ



## “Kurd û “Girêbesta Tirkayetîyê

**N: Mîstefa Zengîn**

Li Tirkîyeyê û Bakurê Kurdistanê di destpêka sala 2016an de 1128 akademîsyenên li zankoyan bo şerê li nav bajarên Bakurê Kurdistanê yê di navbera endamên PKKê û leşkerên Tirk da belavokek îmza kirin. Ev belavok bi ser navê “Akademîsyenên Ji Bo Aştîyê” hat belavkirin û ew akademîsyenên belavok îmza kirin, gotin, “em nabin hevkarên vê tawanê”. Pîranîya akademîsyenan kurd û ji çepgirên Tirkên bûn. Piştî vê rewşê tevahîya wan akademîsyenan ji karê xwe hatin dûrxiştin. Yek ji wan jî akademîsyenê Tirk yê bi navê Barış Unlu bû. Barış Unlu di Beşa Zanîstîyên Siyasî ya Zankoya Ankarayê da mamoste bû û herweha wek dostê kurdan tê nasîn. Ev akademîsyenê Tirk bi hevkarîya hevlekî xwe yê din kitêbek li ser Îsmail Beşikçi jî amade kiriye. Ligel vê yekê di azmûneke/îmtîthaneke waneya xwe de ji xwendekarên xwe pirseke di derbarê kitêbên Serokê PKKê Abdullah Ocalan da jî pirsî bû û ji ber vê yekê jî doz lê hatibû vekirin. Barış Unlu doktoraya xwe li Zankoya Binghamton a Amerîkayê temam kiriye û bi taybetî li ser kolonyalîzmê û Xebatên Çermspî/Postspî (Whiteness Studies) dixebite. Ji bo wergera Tirkî ya gelek berhemên li ser kolonyalîzmê karê edîtorîyê kiriye. Herî dawîyê jî di sala 2018a da di vê çarçoveyê da kitêbeke wî ya bi navê “Türklük Sözleşmesi: Oluşumu, İşleyişi ve Krizi” (Girêbesta Tirkayetîyê: Pêkhatin, Karkirin û Kêşeya Wê) derçû. Di vê nivîsê da jî ez ê hewl bidim bi kurtasî behsa vê kitêba wî bikim.

Barış Unlu di beşa yekem a kitêba xwe ya “Girêbesta Tirkayetîyê” da li ser babeta “Hizirîn Li Ser Çermspîyê” radiweste û balê dikişîne ser Xebatên Çermspîyê û

helwest û fikrên nûserên navdar ên çermreşîk, wek Franz Fanon, Stokely Carmichael û Steve Biko. Barış Unlu têgeha xwe ya “Girêbesta Tirkayetîyê” li ser têgeha “Girêbesta Nijadî” (The Racial Contract) ya feylesofê reşîk Charles W. Mills dixwîne û ava dike. Li gorî Mills, di navbera çermspîyan da li dijî çermreşîkan lihevkerî formel û înfîrmel hene û tevahîya van lihevkerînan “Girêbesta Nijadî” pêk anîye. Armanca bingeîn a vê girêbestê jî ew e, ku çermspîyan li hemberî kesên derveyî çermspîyan (kesên çermspî nînin) bi awayekî sistematîk bike xwedî awanta, derfet û îmtîyaz. Bi pey fikra Unlu, girêbestê bi vê şeweyê di navbera tirkên da jî heye û dide zanîn, ku gelek xal û taybetmendiyên hevpar hene di navbera Çermspîyê û Tirkayetîyê da û ew dixwaze van hevparîyan nîşan bide, ku ew hevparî jî li ser derfet û îmtîyazên wan pêk hatine.

Barış Unlu di warê bikaranîna metafora “girêbest”ê da dide zanîn, ku fikir an jî metafora girêbestê li gorî têgeha îdeolojîya serdest, ku gelek zêde tê bikaranîn, ji gelek alîyan ve rewşê hîn baş rave û eşkere dike. Fikra/metafora girêbestê derfetê peyda dike, ku em karibin çîna/tebeqeya jêrîn jî wek kirdarên wan performans û çalakîyên Tirkayetîyê bibînin û binirxînin. Ji ber ku ew çîna/tebeqeya jêrîn jî bi saya aîdbûna xwe ya neteweya serdest derfetê dibîne, ku berjewendiyên xwe biparêze û ji peywendiyên desthilatîyê sûdê werbigire. Lê belê têgeha îdeolojîya serdest tenê çîna/tebeqeya jorîn û serdest wek kirdar û çalak nîşan dide û di birêkxistina performans û çalakîyên Tirkayetîyê da çîna/tebeqeya jêrîn wek pasîf û obje, heta dikare were gotin, ku wek “bêguneh” nîşan dide. Nûser bi awayekî din balê dikişîne ser, ku her çiqas hemû tirk bi awayekî çalak û aktîf beşdarî vê “Girêbesta Tirkayetîyê” nabin jî, ji vê girêbestê, ji îmtîyaz û derfet û konfora vê girêbestê sûdê



werdigirin.

Li gorî nûser ji tebeqeya jorîn heta tebeqeya jêrîn, ji karsaz û karmendan heta karker û zehmetkêşan, ji mêran heta jinan, ji alîyê siyasî yê desthilatîyê heta aliyê siyasî yê opozîsyonê, ji dîndar û rastgiran heta sekuler û çepgir, bi giştî di navbera hemû tirkên de li dijî kurdan “girêbestê veşartî/sembolîk” heye û hemû tirk bi awayekî xwedî îmtîyaz ji vê girêbestê sûdê werdigirin. Bi gotina nûser, ev girêbest tiştekî weha ye, ku di ser îdeolojîyan ra ye û îdeolojîyên cuda yên di nav tirkên da li ser vê girêbestê li hev kom dibin. Dikare bi kurtasî were gotin, ku gava mijar dibin kurd an jî mafên neteweyî yên kurdan hemû tirk bi awayekî lihevkerî li gorî vê girêbestê tev digerin. Ev girêbest, ne girêbestê nivîskî ya Tirkîyeya modern e lê li gorî nûser, bandor û karîgerîya vê girêbestê zêdetir e ji girêbestên nivîskî û fermî.

Nûserê kitêbê eşkere dike, ku Girêbesta Tirkayetîyê di çarçoveya du rewşên wek pozîtîf û negatîf da pêk tê û serdestî û îmtîyazan dide hemû Tirkên. Di warê rewşa pozîtîf da Tirk çawa bixwazî dikarin wiha kurdan bibînin, bizanibin, bibihîzin, hîs bikin û eleqeder bibin û di warê rewşa negatîf da jî Tirk çawa bixwazî dikarin kurdan nebînin, nizanibin, nebihîzin, hîs nekin û eleqeder nebin. Lê di her şert û mercê da ev herdu rewşên pozîtîf û negatîf nîşaneyên serdestî û desthilatîya Tirkên

in. Bi gotineke din, ger Tirk bixwazî kurdan bibînin an nebînin, bizanibin an nezanibin, bibihîzin an nebihîzin, hîs bikin an hîs nekin û hwd., ji ber ku ew serdestî û desthilatîya Tirkên heye, ku bibin kirdar û diyarkerên wan rewşên pozîtîf û negatîf. Lê nûserê kitêbê destnîşan dike, ku piştî salên 1960î, wate li gel xurtbûna tevgerên azadîya neteweyî yên kurdan li dijî desthilatî û serdestîya tirkên, “kêşeya Tirkayetîyê” rûdaye. Bi taybetî di warê wan rewşên negatîf da Tirkayetî rastî kêşeyê hatiye. Pêkhatin û xurtbûna tevgerên azadîya neteweyî yên kurdan ew rewşên negatîf, ku kurd nedihatî dîtin, zanîn, bihîstin û hîskirin, ji holê rabûn û têk çûn û ew kêşeya Tirkayetîyê jî kûrtir bû. Ji ber ku êdî Tirk bixwazî jî nikarin kurdan nebînin, nizanibin, nebihîzin, hîs nekin û bi wan ra eleqeder nebin.

Wek gotina dawîyê di derbarê kitêbê da vê yekê jî dixwazim bibêjim, ku nûser berîya babeta “Girêbesta Tirkayetîyê” û babetên di derbarê wê da, behsa du girêbestên wek “Girêbesta Osmanîyê” û “Girêbesta Mislimantîyê” dike. Bi kurtasî “Girêbesta Osmanîyê” behsa tiştekî weha dike: Împaratorîya Osmanî di dawîya sedsala 18an û destpêka sedala 19an da êdî hatibû dawîya temenê xwe û ji bo ev împaratorî li ser lingan bimîne di gelek warên wek siyasî, civakî, çandî aborî, hiqûqî û leşkerî da reform dihatin pêkanîn. Bi



»»»»Doma R:4

rêya van reforman dihat xwestin, ku di navbera Împaratorîya Osmanî û alîyên cuda û heterojên yê komelgeha vê împaratorîyê da girêbestêk çêbibe. Lê ev girêbest, ku wek “Girêbesta Osmanî-tîyê” tê pênasekirin, bi ser

neket. Piştî vê yekê Şahê Împaratorîya Osmanî Evdîl-hemîdê Duyem bertekên Îslamî yê mislimanên Osmanî û îslama siyasî ya di navbera tebeqeya navîn da bi kar anî û ew “Girêbesta Osmanî-tîyê” veguherand “Girêbesta Mislimantîyê”. Bi rêya vê girêbestê li dijî gelek komelgehên “xeyr-î

muslîm” komekujî hatin kirin û ew komelgeh hatin tunekirin û koçberkirin. Herweha ev “Girêbesta Mislimantîyê” her çiqas li ser bingeha wekhevîya hemû mislimanan hatibû avakirin jî, di rastîyê de weha nebû. Neteweya serdest a Tirk zêdetir ji vê girêbestê sûd werdigirt. Ji ber ku aktor û failên sereke yê

vê “Girêbesta Mislimantîyê” Tirk bûn û ji “Cemîyeta Îttîhad û Terakkîyê” (Cemîyeta Yekîti û Pêşketinê) bûn. Jixwe “Girêbesta Tirkayetîyê” jî bi pêşengtîya kadroyên vê cemîyetê ji nav “Girêbesta Mislimantîyê” derket.

Cavkanî: Kovara Tîşk hejmar 53

## Êzîdî û asoyên pêşerojê



N: Nadir Doxatî

Bê guman, Êzîdiyên li Şingal û li deverên din yê Kurdistanê tûşî êrîşeke hovane û metirsiya qirkirineke mezin (jenosîdê) ji aliyê rêxistina terorîst û hovane (ISIS) hatin, û bajarê Şingalê di heman demê de wekî bajarên din yê Kurdistanê Kobanî, Efrîn, Serêkaniyê û Kerkûk hat dagîrkirin, lê bajarê Şingal cudahiyeke heye ji bajarên din yê Kurdistanê, ji ber taybetmendiya xwe ya olî ya cuda, ji ber ku Êzîdî lê dijîn, ku di bîr û hizra terorîstan de bi kafir û “murteb” têne naskirin, û li gor boçûna wan terorîstan ku divê ew werin qirkirin û serjêkirin û bêne kuştin û koçberkirin û jin û keçên wan wekî destkeftiyên şer bêne talan, kirîn û firotin, û bi zordestiyê dest ji axa welatê xwe berdin.

Erê, Şingal birîneke kûr e sarêj û derman nabe, û tiştê hatî bi serê xelkê sivîl yê vî bajarî bi rêya fermana vê dawiyê, ti carî ji bîr naçe, û wê bimîne dexmeyerê reş ya mehkûm û riswa li ser eniya mirovahiyê, û li ser eniya wan hovên bê wijdan û dîn, û em tu carî xwîşk û birayên xwe yê Êzîdî ji bîr nakin, yê ketin di nav lep û destê wan terorîstan de, bi rêya oparesyonên jinavbirina etnîkî û olî, ku tûşî hemû rengên îşkence û zilmê hatin,



di girtîgeh û zîndanên van girûpên reş û tarîxwaz de, tevî rewşa dijwar û şert û mercên jiyana zehmet ya Êzîdiyên di kampan de dijîn, yê bi darê zor û stemê ji gund û warê xwe koçber bûne, û heta vê gave. Ji ber vê yekê çareserî çî ye? .

Civata Êzîdî di nav şert û mercên zehmet de derbas dibe ku divê em hemû li ser rewşa wan bisekinin ji bo dermankirina vê birîna kûr û baştirkirina rewşa jiyana wan li ser bingeha xebateke bingeîn ji hemû aliyên zaniştî û akademîkî û siyasî ve, vê rewşê binerxînin ji bo rêxistina navmala Êzîdiyan, û yekxistina gotina wan û paraştina taybetmendiya wan ya olî, ya ku bi dirêjahiya 14 sedsalan nasnameya xwe ya olî û neteweyî paraştî ye, û tu carî xwe teslîm nekiriye û herdem li hember fermanan bihêztir û xurtir bûye, û di nav van bûyerên reş de, pêdivî ye ku em ji xwe bipirsin: kanî Êzîdî ji van hemû neheqîyan? Ku dabeşkirin û veqetandina Şingalê ji axa Kurdistanê û dabeşkirina Êzîdxanê di navbera Şingal û Şêxanê de û berdehamiya dagîrkariya Heşda Şe’bî li ser Şingalê, ku ev yek eş û birînen me kûrtir dike, û bê tifaqê di navbera Êzîdiyan de zêde dike, û bê guman ev nakeve di berjewendiya civaka Êzîdî de, û rewşa wan xirab û aloztir dike.

Ji ber vê yekê, em wekî rewşenbîr û ronankbîrên Êzîdiyan divê bi xwe kom bikin, destê hev bigirin, û li ser rastîya xwe bi hişmendî bisekinin û vê rewşê binerxînin, û li ser kêmasiyan rawestînin û riyên ji bo çareserkirina wan bibînin, û bi vê yekê dîsa baweriya civata Êzîdiyan ji bo siberojeke baştir ji bo keç û kurên xwe misoger bikin wekî xwendina me ji tekstên ola me ya pîroz ya bi zimanê zikmakî bi kurdiya resen hatine nivîsandin. Di dawîya dawîn de, ji vê helwestê, ez bang li hemû mirovên aqilmend yê gelê xwe dikim ku bi hişmendî bixebitin û nekevin di nav davan de, ku dê tenê zirar, ziyan û perçebûnê ji me re dê peyda bikin, ku bi tenê dê bikevin di xizmeta ecindayên dijminên Kurd û Êzîdiyan de, û divê em vê fersendê nexin destê dijminên me.

Em peyva xwe yek bikin, û yekîti û yekrêziya me garantiya yekane ye ku nasnameya me ya rasteqîn ya kurdî biparêze. Êzîdî Kurdên resen in, na û hezar carî nexêr ji planên biyanî yê li dijî Şingalê têne lidarxistin, belê ji bo vegera ewlehî, tenahî, xizmrtozariyan, û vegera koçberên Şingalê li ser axa bav û bapîrên xwe, û belê ji bo vegera Şingalê û ku Şingal zû yan dereng wê vegera himbêza dayîka xwe Kurdistanê.



## Gel dijberên sereke yên rêjîmê ne



N: Azad Kurdî

Bûyerên ku di van 2 heftiyên borî de li Rojhilata Navîn çêbûn, rejîma Îranê kirin mijara sereke ya mediya û nîqaşan di asta navneteweyî de. Zêdegavî û destêwerdanên rêjîma Îranê li herêma Rojhilata Navîn û bi taybet li welatên Îraq, Sûriye, Lubnan, Yemen, Efganiştanê bo piştevanîkirin ji girûp û komên hevîr û tîkder li wan welatan û alîkariyên milyon dolarî ya rêjîma Îranê di mehê de ligel wan rêxistinên tundajo û terorîst, êdî bibû cihê nigeraniya civaka navdewletî û bi taybet Dewletên Yekbûyî yên Amerîka. Lewma Amerîka neçar ma pasdarê terorîst Qasim Silêmanî, fermanderê Spaha Quds a Îranê li Bexdayê ji nav bibe. Kesek ku rêveberê hemû pîlanên tîkderane yên rêjîmê bûye li herêmê û ew welatên ku Îranê aloz kirine. Bi vê bûyerê Rojhilata Navîn gihîştê asta sereke rûbirû, lê piştê bûyereke micid derneket holê, lê nakokî û dijberiyên Amerîka û Îranê gihîştine asta herî micid. Ligel ku Amerîka bi dorpêçên herî qurs û berfireh di dîrokê de, rêjîma Îranê ligel qeyranên mezin rûbirû kiriye.

Kuştina Qasim Silêmanî rêjîm evqas perîşan û tevlihev kir û dunya wisa ber wan bezir bû ku Spaha terorîst a Pasdaran bi 2 mûşekan balafireke sivîl ya Ukraynî xistin xwar û hemû kesên tê de jiyana xwe ji dest dan. Karesateke mezin ku rêjîmê her ji destpêkê xwestê ve cinayeta xwestê veşêre weke pişeya xwe ya hergav. Lê her zû derket holê



ku wan bi zanayane balafir xistiye xwarê û ev karesat afirandin. Ev yek tirs û perîşaniya herî zêde ya karbideştên hov û dîktatorên Îranê da nîşan dan. Ev yek bû sedem ku dubare çend rojan bajarên Îranê bibin qada xwenîşandan û nerazîbûna li tevahiya vê rêjîmê.

Berîya 2 mehan, xwenîşandan û nerazîbûnên herî mezin di dîroka 40 sal desthilatdariya rêjîma Xomêynî li pîrriya bajarên Îranê bi hêceta zêdekirina bêrade a buhayê benzînê pêk hatin. Meş û xwenîşandan gellek berfireh bûn û rêjîmê bi başî heşt bi vê nerazîbûnê micid kir. Lemwa weke pişeya herdemî ya xwe, pasdar û çekdarên hov yên rêjîma Xomêynî ketin canê xelkê nerazî yê sivîl û bi hezaran xelk kuştin, birîndar kirin û destbiser û girtin. Gellek kesên destbiserkirî di bin îşkenceyan de jiyana xwe ji dest dane. Lê vê yekê qet gel çavnetirs nekiriye û berxwedanê berdewam bibe.

Ev nerazîbûnên berfireh bi yek şev û roj pêk nehatine, ev yek berhema 40 sal siyasatên şaş û dijî gelî yên rêjîmê ne. Stîratêjiyeke bingeîn a rêjîma Îranê ev bûye ku bi qirkirin, tepeserkirin û cinayetan xelkê çavtirs bike ji xebatkirin bona azadî û mafên xwe yên mirovî. Lê vê yekê bersiv û encameke bi tevahî dij bo rêjîmê hebûye.

Em dibînin ji xeynî kesên kirêgirtî yên ser bi rêjîmê, kes ji vê dewletê razî nîne. Her derfetek pêk tê, kûrahiya nerazîbûn û dijberiya xwe li rêjîmê nîşan didin. Ji ber ku rêjîmê qet rêz ji îradeya gel bona diyarîkirina çarenivîsa wan negirtiye. Belku eva Welîyê Feqîh û komek Pasdar û Meleyên kevneperest in ku hemû çarçoveya biryarên rêveberiya welat li stû girtine û bûye mafîyayeke mezin. Sîstemeke siqet a rêveberiyê ku tenê li hinek welatên komînîst ku ew jî dostên rêjîma Îranê ne, tê dîtin. Kambaxtir ji vê yekê eva ye ku evna dixwazin ev modela rêveberiya xwe ya ser û bin siqet û ne durust, bikin mînak bo welatên weke Îraq û welatên din ên herêmê. Lewma li xwenîşandanên Îraqê jî, me dît çawa nefreta xwe ji destwerdan û siyasatên rêjîmê li Îraqê nîşan dan û çend car kunsolxaneyên Îranê li Necef, Kerbela û bajarên din şewitandin.

Rêjîma Îranê baş agahdarê kûrahiya dengên nerazî yên gel li sîstema xwe ya gendel heye û di rastî de ev nerazîbûn weke bombeke bihêz e ku hergav egera wê heye biteqe ku êdî wê demê dar ser ber nahêle bo vê rêjîma sedsala navîn. Ziman û şeweya rêveberiya vê rêjîmê jî li hember gelên Îranê û bi taybet gelê kurd, qirkirin, kuştin, girtin û zordarî bûye. Lê qet bersivder nebûye.

Kerameta mirovan li çarçoveya rêjîmê bê wate ye û mirov tenê li gor nerîna wan alev in bona propaganda û misogerkirina desthilata rêjîmê. Bo nimûne, hîlbijartin li çarçoveya vê rêjîmê dîr in ji hemû bingeş û pîvanên demokratîk û serdemiyane. Bi mîkroskobê jî mirov nikare bibîne ku keseke xelkî di van 40 salên borî de li bi nav hîlbijartên şanoyî ku rêjîm rêve dibe salane, bikare karîbe berevaniyê ji mafên gel bike û kiribe. Lê rêjîm bi hemû zext û fênd û fêlan hewl dide xelkê bikişîne ser sindoqên dengdanê da ku rewayî û berheqiyê ji desthilata xwe re li asta navdewletî pê biselimîne. Ligel ku em dizanin ew hîlbijartin li Îranê çiqas nateba û dijber in ligel standard û pîvanên demokratîk yên demokrasiyê. Lê rêjîm vê rêjeya beşdariyê weke fakt li derve bikar tîne bona razîbûna gel ji sîstema wan. Ev yek ji îradeya gelan bi dîr e, îradeya gelan di meş û xwenîşandanên berfireh yên 2 sal berî niha û îsal derket holê û bi başî gişîştê guhê Xamineyî û mafîya wî ya desthilatdar.

Bi kurtî, rêjîma Îranê li gor îdeolojiya xwe ya tundajo herdem hewl dide dijminên ferzî li derve ji xwe re çê bike, ji aliyê din her dengeke nerazî li navxwe bi hevêlbûn ligel wan dijminên xeyalî, tê tometbarkirin û fetisandin. Rêjîmê pîrriya welatên herêmê û cihana derve ji xwe re kirine dijminên ferzî û xeyalî, bê xeber ji vê yekê ku dijmin, neyar û neraziyên sereke yên wan gelên Îranê bi xwe ne. Gelên ku zordariya rêjîmê heta qirika wan hatiye.

Desthilatek ku bingeha gelî nebe û gel bedela piştevaniyê, nefretê jê bike, desthilateke demkî û çûyî ye û em vê rastîyê di meh û salên dawî yên temenê rêjîma Xomêynî de dibînin. Li berê heta niha û pêşerojê jî eva îradeya gelan in ku serdikevin, nek qirkirin, zordarî û çewisandin.



## Nerîna Lîderan



Donald Turmp:

“Aboriya Îranê ber bi hilûşînê ve diçe û xelkê Îranê jî êş û janan dikişînin û Elî Xamineyî jî dibe aghdarê axavtinê xwe be”.



Sergey Lavrov:

“Hinek zanyariyên dilgiranker ghiştine me, em niha lêkolînê li ser wan zanyariyan dikin ku HSDê li hemberî pere tawanbarên wekî DAÎŞê azad dike ku li navçeyên cuda yên Sûriyê belav dibin”.



Mezlûm Kobanî:

“Ew raporên ku Wezîrê Derve yê Rûsyayê behsa wan dike ne rast in”.



Elî Xamineyî:

“Piştî vê ku Amerîkayê ji rêkev-tina etomî hate derê, min daxwaz kir ku bawerî bi Feransa, Brîtanya û Almanyayê nekin, ji ber ku ew welat ximzeta Amerîkayê dikin”.

## Îran bandora xwe li Yemenê zêdetir dike



N: Eskender Ceiferî

Li gora raportên Neteweyên Yekbûyî ji destpêka şer û pevçûnên Yemenê ve nêzîkî sê milyon kesan li wî welatî cih û warên xwe guhertine yan jî koçberî dervey welat bûne.

Seûdî û 8 dewletên din ên Erebi (Îmarat, Behrêyn, Qeter, Misr, Urdun, Merakiş, Sûdan û Singal) ji sê salan beriya niha ve bi rengekî eşkere tevdigerin ku hêza Hosiyan lawaz bikin. Wan dewletan heya niha piştî serokkomarê hilibijartî girtiye û dijatiya Hosiyan dikin. Lê di vê navberê de rejîma Îranê jî alîgiriya Hosiyan kiriye û carna jî gef li Seûdiyê xwarine.

Amerîka, Almanya, Brî-tanya, Kanada, Tîrkiye û Çîn weke 6 dewletên piştevanên wan 9 dewletên Erebi tene binavkirin û Cîbotî, Irître, Somali û Fransa jî alîkariyên locistîkî pêşkeşî wan dikin.

Seûdiyê ragihandiye ku ew ji ber destêwerdana rejîma Komara Îslamî di karûbarên Yemenê de neçar in bandora xwe nîşan bidin. Riyaz dibêje rejîma Tehranê bi piştevaniya Hosiyan li sînorên başûrê wî welatî metirsiyan ji bo wan çê dikin.

Rejîma Komara Îslamî û Hiz-bullaya Lubnanê jî bi şandina çekên giran ji bo piştevaniya Hosiyan hatine tometbarkirin û li wir, dehan caran wêneyên Rûhulla Xumêynî avakerê rejîma Îslamî a Tehranê ji aliyê Hosiyan ve hatine hildan.

NY dibêje pêwîstiya 9 milyon û 600 hezar zarokan li Yemenê bi alîkariyan heye. Seûdî û Îran jî hevdu bi alozkirina rewşê tometbar dikin. Hêzên ku rejîma Ko-



mara Îslamî piştevaniya wan dike, di bin navên Komîteya Şoreşgêran û Civata Bilind a Hosiyan de dest danîne ser gelek navçeyên rojava weke Sena. Alîgirên Ebd Rebbe li parêzgehên rojhilat weke kendava Eden bicî ne û El-Qaîdeyê jî dest daniye ser hin navçeyên girîng li rojavayê wî welatî weke El-Beyza û Hezr Mot.

Berpîrsên Îranî dibêjin destêwerdana wan di karûbarên Yemenê de tenê weke taktîkek e ku li hemberî gefên li ser Hosiyan û berjewendiyên Îranê bi kar tê. Ew îtirafê jî dikin ku Hosî, bi nûneratiya wan li sînorên Seûdiyê di nav axa Yemenê de şer dikin û teezê dikin ku Îran, wê Hosiyan bike Hizbullaha Yemenê. Lê ew îdiayê dikin ku heya niha çek radeştî Hosiyan nekirine. Tevî vê jî rejîma Îranê, her-tim pesna Hosiyan dide û dibêje Seûdî li wir mafê Hosiyan bînpê dike û şerê birakujîyê çê dike.

Beriya niha Ehmedrizza Pûrd-estân fermandarê hêzên be-jayî yên Artêşa Îranê îdiaya Seûdiyê ku dibêje Îran beşek ji pîrsa Yemenê ye û çekan dişîne wî aelatî, red kiribû.

Mîstefa Selamî cîgirê fer-mandarê Sipaya Pasdaran jî dabû xuyakirin ku Hosiyan di warê çekên giran û perw-erdeya leşkerî de pêwîstî bi Komara Îslamî nîn e.

Li gor zanyariyên çavkaniyên serbixwe û navendên lêkolînê ên Amerîkî, di du salan de 44 endamên Sipaya Pasda-ran û Hizbullaya Lubnanê li Yemenê hatine kuştin yan

jî bi dîl hatine girtin. Sala 2015'a 10 kes, 2016'an 5 kes û ji destpêka 2017'an ve 8 kes ji endamên vê rêxistina terorîstî a Îranî li wir hatine kuştin.

Destpêkê Îranê karîbû hêzên Hosî li hemberî dewletê pêş bixîne lê niha rewş hatiye guhertin. Wê demê, Sipaya Pasdaran li Yemenê tenê ew hêz perwerde dikirin û qet beşdarî şer nedibûn û kampên perwerdeya leşkerî dûrî navçeyên şer hatibûne avakirin. Lê dema ku gelek navçe di sala 2014'an de ji kontrola Artêşa Yemenê derketin, hêzên El-Qaîde dest danîne ser hin navçeyan û derbeyên giran li hêzên Îranî û Hosiyan dan.

Hejmara kuştîyên Îranî li Yemenê ên 6 mehên destpêka 2017'an ji salên berê zêdetir e û ev jî vê raştîyê nîşan dide ku rejîma Komara Îslamî dixwaze giraniyê bide ser wî welatî da ku eger Seûdî bixwaze êrişê bike ser Îranê, ew jî bikarin kartên xwe bi kar bînin. Li ber çavên ci-vaka navdewletî jî bi rengekî behsa Yemenê dike ku li gor îdiaya wan, tenê mafên Hosiy-yan li wir hatine bînpêkirin.

Herwisa Îsraîl ji hevkarîya di navbera Lubnan û Îranê de li Yemen û Sûriyê nîgeran e û beriya niha Harry Kohen balyozê Îsraîlê li Rûsiyê go-tibû ku eger wan rêveberîya navçeya Golan bida hikûmeta Sûriyê, niha Hizbullah û leşkerên Îranê li wir bûn. Ev jî gefê li berjewendiyên wan li navçeyê dike û Îsraîl hewl dide di riya hevpeymanên xwe de di vê debarê de tev bigere.



## Guhertina demografîk li Efrînê



N: Zehra Ehmadi

Demografiya navçeyên Kurdîstana Sûriyê, di qonaxên cuda û dirêj de hatine guherandin di hewildanên tinekirina nasnameya Kurd û kêmkirina hejmara nifûsa Kurdan, bi siyasî darê zorê û bikaranîna tawanên ku li gorî yasayên navdewletî dikevin di rêza tawanên şer û dijemirov de. Opaşyonên herî metirsîdar yên guhertina demografi li serdema deşthilata Be'is û guhertinên demografi yên vê dawiyê bi rêya dagîrkeriya Tirkîyê ya li ser Efrîn, Serêkaniyê û Girêspî hatin pêkanîn. Gelek piroje û siyasî çewsandina netewî ji hêla rayedarên deşthilatdar



li Sûriyê li dijî gelê Kurd hatine pêkanîn, ku mîletê Kurd ji hemû mafên xwe yên rewa hatine bêpar kirin, û projeyên nijadpêrêst û biryarên awarte li dijî hatine sepandin û ji wan bi taybetî guherîna demografiyê li deverên Kurdî. Mezintirîn guherîna demografiyê bi rêya projeyê bi nav "Kembera Erebî" ji hêla hikûmeta Sûriyê li sala 1974-an de deşt pê kir, bi deştanîna li ser zewiyên çandiniyê yên cotyar û gundiyan Kurd li deverên sînorî li herêma Cizîrê ji (Serêkaniyê heta Dêrikê), û dabeşkirin wan zewiyan li ser hawirdên ereb ji Reqayê û Helebê.

Di 26.06.1974-an de, hukûmeta Sûriyê bi fermî

deşt bi pêkanîna projeya "kembera Erebî" kir, bi dirêjî 350 û 370 km, û paniya 10-15 km ji sînorên digel Kurdîstana Îraqê heta rojavayê Serêkaniyê, bi avakirina bi dehan gundan ji bo bicihkirina Erebên bi nav "Alxemer" li Dêrik, Tirbêspî, Qamişlo, Amûdê, Dirbasî, Tiltêmer û Serêkaniyê... Li Efrînê, guherînek demografi ya cidî ji hêla dagîrkeriya Tirkîyê tê pêkanîn bi rêya kuştin û koçberkirin û hawirdkirina Erebên Idlib û Şamê û Dêrazorê li gorî bazarên siyasî. Pêngavên sistematîk yên guhertina demografi bi girseyî, bi rêya opaşyonên leşkerî, dizîna şûnwarên dîrokî, şewtandina dariştan û zewiyên zeytûnan, û kuştin û revandin û îşkenceyê li ser deştê Tirkîyê û çeteyên opozisyona Sûriyê li dijî gelê Kurd tene pêkanîn.

Tirkîyê, bi hevkarîya çeteyên xwe rê digire li pêşiya vegera xelkê koçberên Efrînê yên koçber bûne ji ber topbaran


û êrîş û deşdirêjiya Tirkîyê, ku bi awayekî sistematîk rê digire li pêşiya vegera wan li ser cih û warên xwe bi rêya peydakirina gelek astengiyan û bînpêkirinên li dijî sivîlan, di nav de kuştin, revandin, talan, talan, girtin û îşkence, herwiha niha bi heman şewayê guhertina demografiyê li Serêkaniyê û Girêspî deşt pê dike. Efrîn û navçeyên Kurdî bûne qurbaniya bazarên siyasî û rêkeftin û agirbestên li Idlibê û deverên din ku bi darê zorê ji hêla çekdarên opozîsyonê ve hêjî opaşyonên guhertina demografi û deşt-biserdegirtina xanî û milkên kurdan li deverên dagîrkerî berdewam in. Guhertina demografi li gorî yasa û peymanên navdewletî, bi tawanên şer tene hesabkirin, û ji ber vê yekê, divê civaka navnetewî bi erkên xwe yên dadrêsi û mirovî rabe, bi rêya bidawîkirina opaşyonên guhertina demografi û dadgehkirin û darizandina tawanbarên wê.

## Du welatîyên Kurd bi 15 sal hatine cezadan

**D**u welatîyên Kurd ên xelkê bajarê Merîwan û Kirmaşanê ku di meşa kombûna nerizayetiyan meha Xezelwerê de hatibûne binçavkirin, bi 15 sal hepsa te'izîrî hatine cezadan.

Pêka nûçeya ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, welatîyekî Kurd ê bi navê "Piştewan Efser" ê xelkê gundê "Nê" a ser bi bajarê Merîwanê, ji aliyê taya 2 a dadgeha îngilab a bajarê Sineyê ve, bi tohmata "alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên Opozisyon ên dijî hikûmeta Îranê, bi 9 sal hepsa te'izîrî hate cezadan.

Ew welatîyê Kurd roja Sêşemî 28'ê Xezelwerê, di meşa kombûna nerizayetiyan de hetibû binçavkirin, û roja Şemî 23'ê Sermawezê bi danîna barimteya 400 milyon tumanî bi awayekî demkî hatbû azadkirin. Ji aliyê din ve jî, roja



Duşemî 23'ê Befranbarê, dadgeha îngilab a bajarê Kirmaşanê, welatîyekî Kurd ê bi navê "Mubîn Muradî" ê xelkê bajarê Kirmaşanê bi tohmata "alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên Opozisyon ên dijî hikûmeta Îranê", bi 6 sal hepsa te'izîrî ceza da.

Ew welatîyê Kurd, di meşa kombûna nerizayetiyan meha Xezelwerê de hetibû binçavkirin, û piştî dawî pêhatina lêkolîna wî, navbirî bi danîna barimteya 200 milyon tumanî ji girtîgehê hatibû berdan.

## Kolberekî Kurd li ser sînorê Çaldêranê bi teqeya çekdarên Îranê birîndar bû



**K**olberekî Kurd, li ser sînorê Çaldêranê ji aliyê çekdarên hikûmetê ve rastî teqeyê hat û di encamê de birîndar bû.

Li gorî raporta ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, di rojên derbasbûyî de, kolberekî Kurd bi navê "Mihemed Miraz" di encama teqeya çekdarên hikûmetê de li ser sînorê Çaldêranê hate birîndarkirin.

Ew kolberê Kurd bê hoşdarî li gundê "Mûradlû" ê ser bi bajarê Çaldêranê, ji aliyê çekdarên Îranê ve rastî deştrêjê hatiye.

Tê gotin piştî û lingê wî

birîndar bûne û bo çareserîya pizîşkî bo nexweşxaneyê bajarê Çaldêranê hatiye veguheştin.

Di bûyereke din de roja pêncşemiyê, 26ê Befranbarê, kolberekî Kurd bi navê "Cemal Balîk" xelkê gundê "Balîk" ê ser bi bajarê Merîwanê, ji zinarên çiyayê Tete ê navçeya Hewramanê verisiya û birîndar bû.

Li gor amara Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa" yê, di sala 2019an de, 251 kolber ji aliyê çekdarên hikûmeta Îslamî a Îranê ve hatine kuştin û birîndarkirin, ku 71 kuştî û 180 birîndaran lixwe digire.



## Şoreşa nû a jinan



N: Sîna Qasimîzade

Jin di nav xwenîşandanan de pêşeng in, ne tenê li Kurdistanê, belkî di Îran û hemû cîhanê de û di nav tev xwenîşanan de têne dîtin. Rola raşteqîne a jinan, di nav xwenîşandanên wê dawiyê de, her ew karakter bû, ku di despêka hatina ser kar a rejîma gendel a Îslamî a Îranê de jinan bi awayekî netirsane xwenîşandan dikirin. Jin di despêka şoreşa gelên Îranê li sala 1357'an, roleke girîng lîstin, bi awayekî ku avakerê rejîma dijî jin û dijî azadiyê û bikuj a Îslamî, Ayetullah Xumeynî, fitwaya xwe a kev-neperestane li dijî jinan da, û daxwaz kir ku bi zorê Hicabê biparêzin û ew jina ku hicabê neparêze dijî Îslamê ye û dibe bê binçavkirin.

Xwenîşandana jinan li dijî fitwaya Xumeynî, wekî yek ji pirotestokirinên mezin yên piştî şoreşê di dîroka çalakiyên jinan de hatiye tomarkirin. Jin di xwenîşandanan de pêşeng in, ne tenê di Kurdistanê de, belkî li Îran û hemû cîhanê û tev ev xwenîşanên ku têne dîtin, rolek serek hene, tevî vê ku ev pirs-girêkên ku tev civatgeh digel rûbirû ye, pirs-girêkên wekî, bilindbûna nîrxên hewcehiyên jiyanê, bêhêvîbûn, hejarî û...hwd, jin hin pirs-girêkên taybet bixwe yên din jî hene ku ew jî di hemû hikûmetên mîrserdest de hene. Di wan kombûnên nerizayetiyan wê dawiyê de, rola jinan û ciwanan bi awayekî eşkere û berçav bû, ku heta rojnameyên



girêdayî rejîmê jî basa rola jinan dikirin, bo mînak: Rojnama “Şerq” ku girêdayî rejîma Îranê ye, di 25'ê Xezelwera sala 1398'an de, di raporeke xwe de nivîsibû ku, roja Şemî kombûna nerizayetiyan ku bi sedema bilindbûna nîrxên benzînê di bajarê Refsencanê de bi rê ve çû, lîderên wê kombûnê du jin û çend ciwan bûn ku agirê xwenîşandanê bi dana siloganan geş dikirin.

Hebûna jinan, hevdem digel tevgerên xwendekaran, kedkaran, jinan û kombûna mamostayên nerazî û malnişinan, bi wateya rastî, ew rejîma dijî jin û mîrserdest, rastî sam û xofê kiriye. Jin pêştî xwenîşandanên wan salên derbasbûyî, hevdem di nav kombûnên nîrizayetiyan wekî, xwenîşandana xwendekaran, kedkaran, mafê çûne jor a ştadiyomê, xebat li dijî hicab a zoremiliyê û ...hwd û li wê derheqê de jî, çendîn kempêyn ava kirine, û herwisa roleke ektîv jî hebûne. Lê, rejîm naxwaze ku jin, digel mîran di yek

refê de bin, ji ber hindê ku hebûna jinan, bi her awayekî, hêza tevgerên civakî, bi çend qatan zêde dike. Ew jinane, kesên şermoke nînin ku evîna wan bi zevicînekê dawî pê bê, ew jinane, ew qehreman in ku daxwaza serbixweyiya jiyanê xwe dikin, bawerî bixwe hene û ew bawerîhebûna bixwe, dijî koletiyê di hemberî rejîma gendel, malbat û civakê de radiwestin, ku wekî nûnerê hevregêzê xwe, bo mafên xwe, şer dikin. Ew jinane şer digel rejîmekê dikin, ku 40 sal e siyaseta xwe a bînpêkarî, di male de rûniştin û veşartina rola jin di civakê de li pey xwe hebû ye.


Di xwenîşandanên wê dawiyê de, ew raştiye hate dîtin ku, jinên Kurd bi destên wala, bi çî awayekî di hemberî bikirêgirtiyên çekdar yên Xamineyî de, singên xwe kirine mortal, û bîr û yada wan jinên ku di xwenîşandanên wê dawiyê de hetine şehîdkirin carek din bilind nîrxandin. Bêguman, jin roleke girîng di herifandina wê rejîmê de hene, qatên

ku di bin bandorên givaş û sansoran de bûne, niha bo berevanîkirin ji mafên xwe, bi yekdemî û bi hev re di şeqaman de banga azadiyê dikin û li hemberî zilm, cudahîdanî û çewtekarî û yê din, bîdengî hilnebijartin û şeref, biwêrî û xîreta xwe di hemberî serkutên hovane yên bikirêgirtiyên rejîmê de bi batom û gazên rondîkrêj nedorandine, û herwisa di xwenîşandanên wê dawiyê de, jin bi çalakiyeke çend beranber ji mîran, rêya biwêrî û azadîxwaziye meşandin, bi rastî cihê şanaziye ye ku dema dibînî li nav her 10 kesên de 8 ji wan neraziyan jin in, ku di refa protestokirinê de siloganan didin. Pêka amaran ku Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê belav kiriye, di xwenîşandanên wê dawiyê de û çend kombûnên din ên nerizayetiyan li sala 2019'an li Rojhilatê Kurdistanê nêzî 32 jin ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine binçavkirin.

Şoreşa wê carê, jin lidar dixin û navê wê şoreşê, dibe şoreşa nû a jinan.



## Pirtûkek nû li ser Komara Kurdistanê hate weşandin



**P**irtûka Yadîgarên Komara Kurdistan a Sala 1946`an, ji aliyê Kakşar Oremar ve hatiye amadekirin û ji Weşanên Sîtavê derket.

Sala 1946`an salek girîng e di nav dîroka kurdan de, çimkî li bajarê Mahabadê Komara Kurdistanê hat avakirin. Heta niha li ser vê Komara Kurdistanê hin pirtûk hatibûn nivîsandin.

Her yekê tiştin nû dîyarî rûpelên kurdî kiribûn û niha yeka din li wan zêde bû ku ev jî, “Yadîgarên Komara Kurdistan a Sala 1946`an e” ev pirtûk ji aliyê Kakşar Oremar ve hatiye amadekirin û ji weşanên Sîtavê derket.

Nivîskar Kakşar Oramar heta niha li ser Komara Kurdistanê, gelek lêkolîn, nivîsîn, hevpeyvîn kirine û niha ew di vê pirtûkê de cih girtine.

Pirtûka ku bi nave “Yadîgarên Komara Kurdistan a Sala 1946`an” hatiye weşandin, û ji hevpeyvîn, analîz, bîranîn, wêne, arşîv, dîtin û nîrxandinan pêk tê.

## Şûnwareke kevnar a Aşûriyan di parêzgeha Duhokê ya Herêma Kurdistanê de hate peydakirin



**Ş**ûnwareke kevnar a Aşûriyan di parêzgeha Duhokê ya Herêma Kurdistanê de hate peydakirin.

Şûnwarnaseke Îtaliyayî bi alîkariya Saziya Şûnwarnas û Şûnwarên Dîrokî a Herêma Kurdistanê, karîn bi awayekî serkevtî, şûnwareke dîrokî a Aşûriyan peyda bikin.

Pêka nûçeyên belavbûyî, tîmeke Şûnwarnas a Îtaliyayê bi alîkariya Saziya Şûnwarnas û Şûnwarên Dîrokî a Herêma Kurdistanê, di parêzgeha Duhokê ya ser bi Herêma Kurdistanê de, serkevtî bûn ku şûnwareke dîrokî a Aşûriyan di wî

parêzgehê de peyda bikin.

Ev şûnware 10 xerîteyên kevirî, micesimeyên Xwedî û paşayên Aşûriyan ji xwe digire.

Peydakirina ev şûnware dîrokî, ji aliyê kesên wekî, Danliyê Merandî bonakosî “Donnelly Marandi Bonakos” û Dr. “Hesen Ehmed Qasim” v bûye û di pirpoyeyeke bi navê “FAIDAL” deşt bi kar bibûn.

Di wan heyaman de heya niha çendî şûnwarên dîrokî ên wiha di Rojhilatê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê, ji aliyê şûnwarnasên bîhanî ve hatine peydakirin.

## Rêya me rêya Pêşewa ye



**N: Hejar Paar (Kelankanî)**

Rêya me rêya Pêşewa

Roja me qed naçe ava

Li meydana çarçîra bû

Me girêdan soz û peyman

Rêbendan ji bo me pîroz e

Hem armanc e hem jî doz e

Qazî rûmet e û rêber e

Komar mebeşt û keder e

Daxwaz a gel serbestî ye

Rizgarî ji bindestî ye

Pêşmerge bi rext û çek e

Dujminê zordestîyê ye

Azadî Rêbaz a Qazî

Ji me re ar û şanazî

Şoreşa pêşmergeyên me

Hêviyek ku gel dixwazî

Rêbendan pîroz e şan e

Rojekî geş e li esman e

Sembola bawer û biryar

Bo pêşeroja kurdan e

Heya hebin em wê dinê

Bo rûmeta Kurdistanê



Em dê bikin kar û xebat

Deşt bernadin ji berxwedanê

Bila dijmin sed hezar bin

Bila mîna gurên har bin

Naçemînin piştta kurdan

Eger kurd bi yek qîrar bin

Komar dê wergere disa

Dê xweş be dilê dayîka

Emê hildin ala rengîn

Li nav bajar û ser çîya

Em zarokên Pêşewa ne

Bi can hesin û pola ne

Em in roj a Kurdistanê

Şêr in li ceng û meydan e

Rêya Qasimlo û Pêşewa

Em bernadin hezar sala

Wê azad be warê rengîn

Bi xwîn û doz a şehîdan



## Zimanê Kurdî

Ji hêla guherîna formê ve, cînavên nenas dibin(2) beş : - Cînavên guhêrbar (tên guherîn) . - Cînavên neguhêrbar (nayên guherîn) .

1- Cînavên guhêrbar ew cînav in, yê ku forma wan, a resen li gora dem û raweyên hevokan tên guhertin, nîşandekên zayend (nêr û mê) û jimarê dighêjin wan, Wek : Yek : - Yekî ji yekê re got Tu : - Ez tuyan (ti-yan) nabînim . ( ) Tişt : - Tişteke heye ji gelek tiştan çêtir e Hemû : - Hemûyan dostên xwe parastin . Hin : - Ez hinan dinasim . Hinek : - Hinek ji hinekan zanatir in Pirr : - Pirraniya gelê kurd bi zimanê xwe naxwînin Çend : - Tu çendan dixwazî ? Filan : - Filano li filanê pirsî Gî : - Min ji giyan pirsî . Giş : - Min ji gişan xwest, lê giştikan deng nekir . Gelek : - Gelekan gundên xwe berdan . Piç : - Piçek ji piçekê şerm nake . Tibab : - Ez tibabekê li bendî te mam . Tev : - Bi tevayî hatin . Kêm : - Gelek kêmasiyên me hene .

- Gerek em li kêmasiyên xwe vegerin .  
Hemû cînavên nenas, ên lêkdayî jî, guhêrbar in, nîşandekên guherînê dighêjin parçeyê dawî, wek :  
Her kes : - Ez ne her kesî dinasim . Filan tişt : - Filan tişt ji filan tiştî çêtir e . HTD.... 2- Cînavên neguhêrbar jî, ew cînav in, yê ku di hemû dem û raweyên hevokan de wekî xwe (bê guherîn) dimînin, Wek : Her : - Her mehê carekê ez diçim Nisêbînê .

- Çi bibe jî, em her bira ne .  
Hiç : - Jiyana bindestiyê hiç e.

- Hiç mirovekî li te nepirsî .  
Çi : - Çi gerekî tebe, bixwaze !

- Te çî got, min got erê !  
Heçî : - Heçî rabû, gote min, na...!

- Heçî kurd be gerek fêrî zimanê xwe bibe  
Hindek ji cînavên nenas di hema - dem de cînavên pirsîyarî û yê nenas in jî, wek : Çi : - Te çî gotibe jî, bila ew be (nenas)

- Tu çî dixwazî ? (pirsiyarî) .  
Çi kes : - Çi kesê hat gotarek xwend (nenas)

- Reşo çî kes e ? (pirsiyarî)  
Cînavên nenas jî, weku hemû nav û cînavên dîtir roleke giring di warê rêxistin û hevoksaziya zimanê

Kurdî de dibînin . Ev cînav di pêvajoya hevokan de dibin kara, berkar, hevalnav û hevalkar :

- Kara :

Kara ew bêje ye , yê ku karê hevokê dike, anku kiryarê kar e.  
Wek :

- Hinek hatin û çendek çûn .
- Tişteke ket .
- Kes bi derdê kesî nizane

- Berkar:

Berkar di hevokê de ew bêje ye, ya ku li ber kar e, bûyera karê hevokê lê dibe, wek :

- Memo rojnameyê dixwîne .

Li vir, rojname berkar e, çiku bûyera xwendinê lê dibe, anku (rojname) tê xwendin . Di zimanê kurdî de berkar (2) beş in :  
a- Berkarê rasteder (rastewxo) :

- Tu çî dixwazî, bixwaze !
- Min kesek li wir nedît . - Zarok her tiştî dixwazin - .... b- Berkarê nerasteder : - Seyda xelat da hinekan . - Zînê berek avête tişteki - Ez bêriya gelekan dikim . - Reşo ji tirsê tişteki nehat vir .
- Min ji gelekan pirsî
- Vê gotarê li her cihî bixwîne !

Hevalnav (rengdêr) : - Reşo gelek heval dîtine - Reşo piçik nan da min . Di van mînakên de cînavên nenas (gelek, piçik) cihê hevalnavan (rengdêran) girtine, anku bûne hevalnavên navan (heval, nan) . Bi pêşxistin û paşxistina wan nav û cînavan, hevok dê wisan bibin : - Reşo hevalin gelek dîtine . - Reşo nanin piçik da min . Bêguman, di van hevokan de cînavên nenas (gelek, piçik) hevalnav in . Li vê gorê jî em karin bipêv in :  
- Pir zarok = zarokin pir  
- Kêm caran = carin kêr .

Lê ku nav ji wan hevokan bêne avêtin û cînav cihê wan bigrin, Wek :

- Reşo gelek (...) dîtine
- Reşo piçik (...) da min

Hingê ev cînavên nenas (gelek, piçik) nema dimînin hevalnav, ji ber ku şûna navên avêtî (heval, nan) digrin û li cihê wan dibin berkarên rasteder ( ) .

**Dom heye...**



## Di sala 2019'an de, 757 mînakên binçavkirinê di Kurdistana Îranê de rû dane

**Ajansa Nûçegihaniya “Kurd”yê di raporekê de amara hevvelatîyên binçavkirî yên Kurdistana Îranê di sala 2019'an de dixîne berçav.**

Ev amaran bi mifahwergirtin ji çavkaniyên bawerperkirî ên navenda amara Ajansa Nûçegihaniya “Kurd”yê hatiye berhevkirin, ew amare bi piştgirêdan bi navnîşanê wan kesên binçavkirî ên li ber deşt de bûye.

Pêka amaran ku li navenda amara Ajansa Nûçegihaniya “Kurd”yê di sala 2019'an de hatine tomarkirin 757 mînakên binçavkirinê rû dane, ev jî wiha ne:

225 kes ji wan kesan li meşa nerizayetiyan meha Xezelwera îsal de hatine binçavkirin. Eva tenê amarek e ku ji aliyê medyayên nefermî ve hatine belavkirin.

Lê Femandeyên Leşkerî ên hikûmeta Îranê li jêr navê “rêberê Fitneçîyan” ev amara belav kirine.

Rêketa 27'ê Sermaweza sala 1398'an, femandeyê Hêza Întizamî a parêzgeha Kirmaşanê, bas ji binçavkirina 250 hevvelatîyên nerazî li jêr navê “Rêber û Rêkxerê têkdanan” kiriye.

Berpîrsên Întizamî û Dedwerî li parêzgeha Sine li rêketa 10'ê Sermaweza îsal, basa binçavkirina 25 hevvelatîyan li bajarê Merîwan û Sineyê li jêr navê “Rêber û Rêkxerê têkdan” kiribû.

Herwisa rêketa 18'ê Sermawezê, Femandeyê Hêza Întizamî a parêzgeha Sine, basa nasîn û binçavkirina 8 hevvelatîyan li jêr navê “Rêber û Rêkxerê têkdan” di dema kombûna nerizayetiyan meha Xezelwera îsal de li bajarê

Merîwanê kiribû.

Hejmara hevvelatîyên binçavkirî ên kombûna nerizayetiyan meha Xezelwera îsal, bi cudakirina bajaran, pêka amara Ajansa “Kurd”yê wiha ne:

Ciwanro 53 kes, Kirmaşan 18 kes, Selasa Bawecanî 11 kes, Serpêla Zehaw 1 kes, Merîwan 43 kes, Sine 63 kes, Urmiye 11 kes, Boka 6 kes, Seqiz 11 kes, Îlam 3 kes, Kamîyan 5 kes, Bane 1 kes, Kelardeşt Mazenderan 1 kes, herwiha du Kurd rûniştîyên bajarên Îsfahan û Kerecê.

Herwisa îsal di bajarê Kirmaşanê de, 10 çalakvanên edebî û ferhengî ên Kurd hatine binçavkirin, û kelûpelên kesî (şexsî) ên wan jî deşt bi ser de girtine, navên wan wiha ne: “Fuad Muzeferî, Ferzad Sefere, Homayûn Ebasî, Ebas Celîliyan naskirî bi “Ako”, Sohrab Mu-



radî, Ehmed Besatî, Daryûş Muradî, Mihy-edîn Esxerî, Mizefer Wetendûşt, Xelîl Esedî Bujranî”.

32 kes ji wan kesên ku hatine binçavkirin jin in.

668 kes ji wan kesan ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin, û 46 kes jî ji aliyê hêzên leşkerî ve hatine binçavkirin.

Herwisa, 73 kes bi êrîşkirin li ser malên wan hatine binçavkirin, û 56 kes jî bi lêgerîna di nava malên wan de, û 34 kes ji wan hatibûne binçavkirin. 34 kes di dema

binçavkirinê de ji aliyê hêzên ewlehî û leşkerî ve hatine eşkencekirin û 4 kes ji wan bi dijwarî hatine birîndarkirin.

Nerohniya qedera hevvelatîyên binçavkirî wiha ye: Di 579 mînakên de ev hevvelatîyên ku ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin, çarenûs û cihê 532 kesan nexuya bûye, û wezîfedarên dadwerî û ewlehiyê di nava malên 138 kesan di dema binçavkirinê de, lêgerîn pêk anîne, û kelûpelê 40 kesan deşt bi ser de girtine, û 26 kes jî di dema binçavkirinê de hatine îşkencekirin.

## Pêşewazî ji termê Dr. “Celal Hacîzade” hate kirin

**Termê Dr. “Celal Hacîzade” ku li roja Yekşemî, 23'ê Befranbarê bi sedema Cêtelêdanê canê xwe ji deset dabû, ji aliyê xelkê bajarên Pîranşar û Serdeştê ve, hate pêşewazîkirin.**

Dr. “Celal Hacîzade”, naskirî bi “Raman”, nivîskar û çalakvanê naskirî yê Kurd, li sala 1354'an, li gundî “Bêtoş” a girêdayê bajarê Serdeştê ji dayîk bibû.

Navbirî, xwediyê

birvanameya Dukto-reya Felsefa Siyasî bû, cuda di vê derheqê de ku xwediyê bîr û hizrên taybet bi xwe hebû, hevdem yekek ji wan pênûs bideşt û kesayetiyan bû ku kelkeleyeke diyarî di warê Kurdnasî û rûnkariyê û xisarnasiyê ya hizra siyasî ya Kurd de hebû.

Termê Dr. “Celal Hacîzade”, bo lêkolînên pizîşkî, bo bajarê Urmiyê hatibû şandin û piştî vegeran-



dina termê navbirî bo girseya wî, di roja 25'ê Befranbarê de, ji aliyê xelkê Pîranşarê ve pêşewaziyeke germ ji termê navbirî hate kirin.

Roja derbasbûyî di bajarê Serdeştê û cihê jidayîkbûna wî de, xelk bi awayekî xemdar hatine ser şeqaman û pêşewaziyeke bê mînak ji termê wî hizirvanê mezin yê Kurd kirin. Rêûresma veguhestina termê wî hizirvanê Kurd, roja Pêncşemî, demjimêr 10'ê sibêzû, ji mizgefta Sor an mizgefta “Camî’e” ya bajarê Serdeştê, ber bi goriştanên Girdesor tê lidarxistin.